Aştî السلام
www.selamdemocratic.com
selamdemocratic@gmail.com
partiya.aşti
ROJNAMEYEKE SÎYASÎ - CÎVAKÎ - ÇANDÎ
Hijmara (45) Gulan 2020

# 25 partî û rêxistinên sîyasî di bin banê "PYNK"ê de kom bûn

Di 18ê gulana 2020an de, 25 partî û rêxistinên sîyasî yên rojavayê Kurdistanê, bi navê "Partîyên Yekîtîya Niştimanî ya Kurd" (PYNK) rêxistineke sîyasî ya nû ava kir.

Di daxuyanîya xwe de, "Partîyên Yekîtîya Niştimanî ya Kurd" daye zanîn ku avakirina vê sîwanê wekî bersivekê ye ji destpêşxerîya Fermandarê HSDê Mezlûm Ebdê re û êdî ew ê li bin banê vê rêxistinê çalakîyên hevbeş bidin meşandin.

Daxuyanîya Partîyên Yekîtîya Niştimanî ya Kurd:

"Ji ber rewşa hestyar a ku Sûrîya û herêm bi temamî tê re derbas dibe, ji ber giringîya hevdîtinên di navbera partîyên siyasî û hêzên kurdî de û ji bo biserxistina destpêşxerîya Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûrîyaya Demokratîk (QSD) a der barê yekrêzîya kurdan û yekkirina helwesta siyasî ya kurdî li Rojavayê Kurdiatnê de, me partîyên siyasî yên Rêveberîya Xweser a Demokratîk û hin partîyên li derveyî Rêveberîyê di 18.05.2020an de civînek li Qamişloyê li dar xist û ev biryar girtin:

- Li jêr navê "Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd", em ê xebatên hevbeş bimeşînin û pêşveçûnên heyî yên der barê yekrêzîya kurdî de bişopînin ku karê şopandinê jî dê bikeve ser milên nûnertîyeke me ya nûavakirî.

- Me logoyek ji bo Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd bijart.

- Wê bi berdewamî civînên nûnerên van partîyan bên lidarxistin da ku nêrînên cuda yên der barê pêşveçûn û bûyerên nû de bên raberkirin û nîqaşkirin.

Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd
أحزاب الوحدة الوطنية الكردية

Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd:

- Parîtya Aştîya Demoqrat a Kurdistanê
- Partîya Yekîtîya Demokratîk (PYD)
- Kongreya Star
- Partîya Demoqrat a Kurdî ya Sûrî (P.D.K.S)
- Partîya Kesk a Kurdistanê
- Partîya Çep a Demokrat a Kurd li Sûrîyê
- Partîya Çep a Kurd li Sûrîyê
- Partîya Lîberal a Kurdistanê
- Partîya Biratî ya Kurdistanê (PBK)
- Partîya Niştimanî ya Kurdî li Sûrîyê
- Partîya Guhertina Demoqrat a Kurdistanê
- Tevgera Nûjen a Kurdistanê-Sûrîya
- Partîya Têkoşîna Demokrat
- Partîya Azadî ya Kurdistanî ya Azad
- Partîya Yekîtîya Niştimanî ya Azad-Rojava
- Partîya Komarî ya Kurdistanî-Sûrîya
- Tevgera Çaksazîyê-Sûrîya
- Partîya Komunîst a Kurdistanê (KKP)
- Partiya Roj a Demokratîk li Sûrîyê
- Şepêla Pêşeroj a Kurdistanê
- Partî Demuqratî Kurdistanî-Sûrî
- Yekîtîya Karkerên Kurdistanê (YKK)
- Partîya Kombûna Niştimanî ya Kurdistanî
- Partîya Rêkeftina Demokrat a Kurdî li Sûrîyê
- Partîya Demuqrat a Kurd li Sûrî (Partî)"

Hevserokê Parîtya Aştîya Demoqrat a Kurdistanê –ku partîyeke sereke ye di vê kombûna nû de- Telal Mihemed, di çarçoveya bûyerên di rojevê de got: "Di dema dawîn de, hin hêzên navdewletî êdî bi xurtî palpiştîya destpêşxerîyên yekkirina hêz û helwestên alîyên sîyasî yên kurdî dikin û herî zêde destekê didin destpêşxerîya Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûrîyeya Demokratîk General Mezlûm Evdê. Bi rastî jî, em vê destpêşxerîya han wekî hemî destpêşxerîyên navdewletî yên berê dihesibînin, her wekî çareserîya sîyasî ku xwe disipêre biryara navdewletî ya 2254an. Heke ev destpêşxerî bi ser bikeve, hêzên navdewletî dê bi berpirsîyarên xwe bihesin û ber bi danîna hevpeyvîneke jidil a di navbera sûrîyan de gavekê biavêjin."

Der barê hevdîtinên PYD û ENKSê de, Mihemed got: "Em derencamên hevpeyvîna di navbera Partîya Yekîtîya Demokratîk û Encumena Niştimanî ya Kurd li Sûrîyeyê de ji nêz ve dişopînin. Di navbera hêzên kurdî de her çareserîyeke ku peyda bibe, dê bandoreke erênî bi xwe re derxe holê, loma ji destpêkê ve em palpiştên vê nêzîkbûnê bûn."

Hevserokê Parîtya Aştîya Demoqrat a Kurdistanê Telal Mihemed, sedema avakirina vê kombûna sîyasî wiha anî zimên: "Nûnerê Amerîkayê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê William Robak û şandeyeke dîplomatîk a Wezareta Derve ya Fransayê bi tevaya partî û hêzên sîyasî re hevdîtin encam dan û ji bo destpêşxerîya HSDê ya ji bo yekrêzîya alîyên kurdî, li hemûyan guhdar kirin. Wan her du milan piştgirîya xwe nîşan da û gotin ku divê hemî hêz û partîyên kurdî di qonaxa duyem de beşdar bibin. Loma civîneke berfireh ji hemî hêz û partîyên sîyasî yên Birêveberîya Xweser re hat danîn û ev kombûna nû hat damezrandin."

Mihemed her wiha da zanîn ku ji "Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd" desteyeke niwênertîyê hatiye hilbijartin, ji bo di civînên li gel ENKSê de wekî niwêner beşdarî danûsitandinan bibe.

Di berdewamîya axaftina xwe de, **Telal Mihemed** ev gava han wiha



nirxand: "Ji bo ku danûsitandina di nav kurdan de hemî hêzên sîyasî yên kurdî li Sûrîyeyê li xwe bigire, ev gaveke erênî û ber bi rêya rast ve ye. Nabe ku danûsitandin tenê di çarçoveya du partîyên sîyasî de bimîne û li ser wî esasî peyman û lihevkirin bêne encamdan; mafê hemî partîyan heye ku tev lê bibin."

Der barê helwesta Encumena Niştimanîya Kurd li Sûrîyeyê (ENKS) li hember avakirina "Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd" de, Hevserokê Parîtya Aştîya Demoqrat a Kurdistanê Telal Mihemed di dawîya axaftina xwe de got: "Ez bawer im alîyên ku sponserên van danûstandinan in dixwazin tevaya hêzên sîyasî yên kurdî tev lê bibin. Di encamê de ev danûsitandin dê di navbera desteya Partîyên Yekîtîya Niştimanî ya Kurd û Desteya Serokatîya ENKSê de bin. Her wiha ez bawer dikim ku helwesta ENKSê dê erênî be, çimkî ev hevdîtin dê bi sponserîya alîyên navdewletî bin."

# Ne tenê qirkirina çandî ye Ji qirkirina çandî biwêdetir e

Li welatekî; faşîzim li ser pêyan be, qirkirin armanc be, tunekirin bi hemû ziravîyên wê pêk were, gelo mirov dikare behsa demokrasî, biratîya gelan û edaleta civakî bike? Ne mimkun e. Bi hemû rêbazên qirêj desthilatarîya dewleta tirk serwerîya xwe belav dike û dijberîya gelan dike. Her çi qas di serî de gelê kurd be, ji xwe bê guman ev bi salan e tê zanîn, lê belê niha li beranberî hemû gelan meydanê dixwîne. Ev hişmendî yek derfetê nade civakê ji bo azadîya xwe bijî, dagirkerîyê bi hemû şêwazên wê bi kar tîne. Ne tenê fîzîkî, erdnîgarî hetanî mudaxeleya çand û aqilê civakê jî dike, li gorî xwe xaçerêkek nexişandiye. Polîtîkaya sereke “qirkirina çanda gelan” e. Di vê mijarê de qada rojavayê Kurdistanê bi têkoşîna salan dikarîbû xwe bigihîne astekê ku xwe biparêze, çanda xwe biparêze û taybetmendîya herî bingehîn jî ku hemû gelên vê herêmê bi salan e di nav çanda biratîya gelan de dijîn parastiye. Li ser vê xaka weke welatê BUHUŞTA SER ZEMÎNÊ tê zanîn bi rastî jî xwedî mozayîkekê ye ku çi qas cudahî hebin ew qasî civak pê mezin dibe û jîyana bi hev re hîna biwate dibe. Qirikirina bi hevkarîya çeteyan tê meşandin, heta niha di dîroka ti gelan de nehatiye dîtin. Gelo daran, şînahîyê, av û axê çi kiriye ku ew qasî bi hovîtî tunekirin û talankirinê dikin. Hemû bîranînên bi salan ên temamê malbatan di malên wan de hilweşandin. Kiryarên li Efrînê pêk anîn hetanî vê kêlîyê jî berdewam in û ji rêzdayîna mirovî dûr û dûr in. Û niha li Serê Kanîyê û Girê Spî, kirîyarên aqilê tu kesekî nikare fam bike diqewimin. Erjenge polîtîkaya qirkirinê hetanî li ser gelê ereb jî pêk tînin, dibistanên taybet ava kirine û tê ferizkirin ku fêrî zimanê tirkî bibin. Malên me xerab kirin, kolanên me guhertin, hafiza civakê tevlihev kirin, armanca sereke ji kokê qirkirina çanda gelan e û di serî de jî çanda kurdan e.

Pirsa yekser tê hişê mirovan; gelo piştî çanda civakê ji cewhera xwe derket, warên dîrokî weha bi hêsanî têne destavêtin û xerabkirin, guherînên demografîk ên bi şêwazên seyr tên guhertin, piştî ev qas hilweşandin, gelo wê zar û zêçên me li ser kîjan hêmanên dîrokî û çandî mezin bibin? Xeterîya herî bieş ev e. Eger tas şikest gelo wê av bi ku derê de biçelqe?

Em nikarin mîna hin kesan hizir bikin û bibêjin; “Rewşa heyî çarenûs e, em çi bikin jî şensê me yê jîyanê tune ye.” Miletên li ber xwe nadin, di wan de zemîna qirkirinê hîna lipêş e. Bi sedan sal in gelê kurd li ber xwe dide û wê li ber xwe jî bide. Berxwedanî ne



Nêrgiz Ismayil

tenê fedayîtîya fîzîkî; parastina çand, ziman û dîroka xwe ya resen e jî. Di vê mijarê de berpirsîyarîya dîrokî dikeve ser milê gelê kurd. Xwedîderketina kurdan li çanda xwe, tê wateya xwedîderketina li resenîya Rojhilata Navîn. Lewra eger kurd bi xwe nebin “XWE” nikarin vê pêşengîyê serkeftî pêk bînin. “XWE”ya me, nasnameya me ya gerdûnî ye. Lewra divê gelê me vê erka xwe bizane.

# Neaxiviya wê bidirîya!

Li Rojava dema qala yekîtî û yekrêzîyê tê kirin, her kesê niştimanperwer destekê dide û dixwaze bigihîje encamê. Lê kesên naxwazin û hincetên cuda tînin ziman, ew dijminê doza kurdan in.

Alîyên heta niha têkilîyên li ser navê ku dewleta tirk ne dijminê kurdan e û tenê dijminê alîyekî ye, çima ew qasî çavên xwe digirin û serê xwe xistine bin axê. Gelo feyda wan jê çi ye? Erê rast e divê têkilî bi hemû alîyan re hebin, lê dewleteke eşkere gefên tinekirinê li te bixwe, ji bo peywendîya pê re, çawa em bên qanihkirin ku normal e. Ma mirov çawa bi dijminê xwe re li ser sifrekê dikare rûne. Ev dijminê ku her roj li Bakurê Kurdistanê gorên zarokên kurdan xira dike û êrişî dayîkên kurd dike, çawa danûstandin wê pê re bibin? Ev dijminê ku li Efrîn, Serê Kanîyê û Girê Spî kurdan qetil dike û yên din jî bi rêbazên cuda ji malên wan dide koçberkirin, malûmilkê wan desteser dike û çeteyan li şûna wan bi cih dike, çawa cîrantî wê pê re bibe? Ev dijminê ku her roj li başûrê Kurdistanê gund û çîyayên kurdan bombebaran dike û zarokên kurdan qetil dike, pê re çawa dostanî wê bibe? Nabe, dijmin nabe dost. Dijminê bavan nabe dostê lawan.

Berî çend rojan Wezîrê Karên Derve yê Tirkîyeyê Mevlut Çavuşoglu dîsa çavsorî kir û li dijî hatina gel hev a PYD û ENKSê axivî û got: “Em ê nehêlin ku lihevhatin pêk were”. Gotinên Çavuşoglu yên niha, heman gotinên Erdogan ên 2017an dema referandûma li başûrê Kurdistanê ya bi destê PDKê, tîne bîra me. Wê demê jî Erdogan digot; em ê rê nedin, hûn kî ne ku qala Kurdistanê dikin. Li ser sînorê başûrê Kurdistanê tank û top, leşker kom kirin û tetbîqata leşkerî pêk anî û her roj gefa êrîşê dixwar. Ew heman gef in û heman hişmendî ye. Hişmendîya dijminatîya doza kurdan e.

Dewleta tirk careke din ketiye nava tevgerê û hewldanên ku dar bixe ber dolaba lihevhatina alîyên kurd li Rojava û nehêle înîsîyatîfa Fermandarê HSDê Mazlûm Evdê ya ji bo yekîtîyê biçe serî. Li alîyekî qala alîyekî “serbixwe” dike û ger ji destê wan derkeve, dixwaze bedîlê ENKSê hazir bike, li alîyekî din gefên tinekirinê dixwe. Gotineke pêşîyan heye, dibêje; “Beq nequre ew ê bidire”. Çavuşogluyê tirk jî weke beqê lê hatiye; ger neaxiviya, ew ê bidirîya. Û di dawîyê de ya xwe got; “em ê nehêlin”.

Her ku encam derkevin holê ji hevdîtinan û hewldanên yekîitîya kurdan li Rojava, em şaş nemînin ku dewleta tirk bo tirsekê çêke, sewqîyeta leşkerî bîne ser sînor û tetbîqatên leşkerî bike û bibêje, ez ê êrîş bikim. Ha ji ber vê yekê divê bi lez alî werin gel hev û pêşîyê li



Mihemed SEYDÎ

hemû hewldanên dewleta tirk a ku dixwaze kurdan bixe qirika hev bigirin. Ew jî tenê bi hatina gel hev a li Rojava nabe. Ger li başûrê Kurdistanê PDK û PKK bikevin şerekî, ew ê çi yekîtî li Rojava bibe? Ger alozîya li Zînî Wertê çareser nebe, ew ê çi yekîtî û lihevkirin li Rojava biçe serî? Ger biçe serî jî ew ê rizîyayî be. Alîyên kurd dikarin bersiva Çavuşoglu û dewleta tirk bidin. Ne bi daxuyanîyan, divê bi helwêsta, ‘çi dibe bila bibe, em ê werin gel hev’ bersiva wî bê dayîn.

# Şêwirmendê Trump: Hevalbendîya me bi HSDê re stratejîk e

## Ev hevpeyvîn bi Endamê Meclisa Şêwirmend a Serokê Amerîkayê “Gabriel Soma” re hatiye kirin.

**Amerîka dibêje ku ew dixwaze alozîya Sûrîyeyê bi çareserîyên sîyasî yên li gorî biryara NYyê û Meclisa Ewlehîyê ya hejmara 2254an, bi dawî bike. Lê belê li gel hebûna arêtşên gelek dewletan ku xwedî ajandeyên cuda li Sûrîyeyê ne, dê ev alozî çawa bê bidawîkirin?**

Biryareke Meclisa Ewlehîyê ku tekezîyê li ser serwerî, serxwebûn, yekîtî û ewlehîya herêmî ya Sûrîyeyê dike, heye. Lewra hebûna gelek arêtşên bîyanî li ser erda Sûrîyeyê di dema heyî de, bi biryara Meclisa Ewlehîyê ya 2254an re li hev nayê. Di dema niha de Esed piştgirîyê ji Rûsya û Îranê digire û Amerîka jî dixwaze her du alîyan têk bibe.

Amerîka stratejîya xwe li ser lawazkirina Rûsya û Îranê ava dike. Îro, em dibînin ku Îran hejmareke hêzên xwe ji Sûrîyeyê vekişand. Ji bo dîtina çareserîyeke aştîyane ji pirsgirêka Sûrîyeyê re, têkilîyên Rûsyayê jî bi hikumeta Sûrîyeyê re ne baş in. Bi rastî jî, hebûna van hêzên bîyanî di dema niha de, biryara Meclisa Ewlehîyê ya 2254an, binpê dike.

**Amerîka di alîyê leşkerî de hevkarîyê bi Hêzên Sûrîya Demokratîk (HSD) re dike û di şerê li dijî DAIŞê de hevkar in, lê belê di alîyê sîyasî de piştgirîya herêmê nake. Sedemên wê yekê çi ne û çi li pêşîya pêkanîna wê yekê asteng in?**

Hebûna hêzên amerîkî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê tenê ji bo sedemekê ye, ew jî hebûna DAIŞê ye. Di dema niha de, 500 leşkerên amerîkî li kêleka hêzên herêmî yên hevalbend li herêmê belav dibin û heta niha em li wir in ji bo piştgirîyê bidin operasyonên li dijî daişîyên mayî.

Rêveberîya Trump hebûna leşkerî ya Amerîkayê ya pir kêm hilbijart, tenê ji bo têkbirina DAIŞê û piştevanîya çalakîyên leşkerî yên dewletên dîtir bi rêbazên cuda. DYAyê ji destpêka şerê navxweyî yê 2011an ve li dijî Serokê Sûrîyeyê Beşar El-Esed e, her wiha piştevanîya komên li dijî Esed di wê demê de kir, piştre jî piştevanîya hêzên bi serkêşîya kurdan li Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê kir.

**Gelo pêşeroja Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê li gel gefên DAIŞ û dewleta Tirkîyeyê tevî hebûna Amerîkayê li wir çi ye?**

Heta ku hêzên Amerîkayê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê ne, texmîn nakim ku dê zirar bigihîne hevalbendên me, Serokê Amerîkayê biryar da ku hêzên Amerîkayê li Rojhilatê Sûrîyeyê bihêle ku parastina herêmê û bîrên petrolê ji DAIŞê bike. Her wiha sedema hebûna Amerîkayê DAIŞ e, ne ji DAIŞê bûya dê DYAyê hêzên xwe neşandibûya.

Petrol hêmana sereke ya şerê li dijî DAIŞê ye, ji ber petrola Sûrîyeyê di destê DAIŞê de bû û difirot dewletên dîtir û aborî qezenq dikir. Ji lew re serok Trump dibîne ku pêwîst e parastina petrolê bê kirin, heke em bixwazin DAIŞê tune bikin û nehêlin vegere Sûrîyeyê, ji lew re em li wir hene. Hevalbendîya Amerîka û HSDê hevalbendîyeke stratejîk e û ji bo tunekirina DAIŞê ye.

**Di vê dawîyê de nûnerê taybet James Jeffrey daxuyanîyên pêwîst der barê derketina tevahî hêzan ji Sûrîyeyê ji bilî Rûsya dan, dê çawa ev hêz bên derxistin bi taybet dewleta Tirkîyeyê ku piştevanîya Cebhet El-Nusra dike. Gelo helwesta Amerîka ji piştevanîya Tirkîyê ya ji El-Nusrayê re çi ye? Niha nîqaş li ser peymana Amerîka-Rûsya der heqê çareserîya alozîya Sûrîyeyê de heye, gelo bi rastî ev lihevkirin hene, an jî sîyaseta Amerîkayê ya nû li herêmê heye û çi ye?**

HIN PIRSGIRÊK DI NAVBERA RÛSYA Û ESED DE HENE Û ESDE LI SER PÊŞNÎYARÊN ÇARESERKIRINA PIRSGIRÊKAN NE RAZÎ YE

Li gel Rûsya tu derîyek ji bo çareserkirina ji pirsgirêkên bi Esed re tune ne, dîyar e ku hin pirsgirêkên di navbera Rûsya û Esed de di çareserkirina gelek pirsgirêkên sîyasî de hene û Esed li ser pêşnîyarên Rûsya yên çareserkirina pirsgirêkên sîyasî ne razî ye.

Erka me çareserkirina pirsgirêkê ji hêla NYyê li gor biryara 2254 e û divê Rûsya dûrî Esed û Îranê be û Rûsya jî vê yekê baş dizane.

Di van demên dawîn de hin vekişînên hêzên bi serkêşîya Îranê hene, hin vekişîn jî tektîkî ne ji ber niha şer nakin, lê belê sedemeke din heye ku pere li Îranê kêm e. James Jeffrey di vê dawîyê daxuyand ku DYAyê hevkarîya Tirkîyeyê di garantîya ewlehîya Idlibê de dike û dibe nekeve destê hêzên Esed. Li gor James Jeffrey gotiye, DYAyê bi Tirkîyeyê re li ser komîteya destûrê û çareya sîyasî dixebite, li gor James Jeffrey hedefa dawîn a Amerîkayê mîna hedefa Tirkîyeyê ye û her wiha Enqere jî Îranê wekî gef ji xwe re dibîne.

**Di navbera hevalbenda DYAyê ya NATOyê Tirkîye û Rûsyayê de hevkarîyek li Sûrîyeyê heye û Tirkîye moşekên Rûsyayê yên S-400î kirîn ku bandorê li balafirên F-35an a Amerîkayê dikin, gelo pêşeroja têkilîya Amerîka û Tirkîye re heke sîstema S-400’î ya Rûsyayê aktîf kir çi ye?**

Têkildarî kirîna Tirkîyeyê ya sîstema moşekên S-400î ya Rûsyayê, ev pirsgirêkeke hê di nîqaşa her du welatan de ye. Ev moşek dijberî hebûna balafirên Amerîkayê yên F-35an in. Her wiha wekî hûn dizanin DYAyê piştî dewleta tirk girêbesta S-400î ya Rûsyayê bi dawî kir ji bernameya F-35an derxist. Em bi tundî li dijberî kirîna Tirkîyeyê ya moşekên Rûsyayê ne û DYAyê dibîne ku ev yek li dijî vîna Tirkîyeyê ya kirîna balafirên Amerîkayê yên F-35an e, ji alîyê xwe ve jî dewleta tirk vê mijarê dispêre serwerîya dewleta Tirkîyeyê di biryarên xwe de.

**Dema nîqaş li ser alozîya Sûrîyeyê tê kirin ne pêkan e li rûdanên li dewletên derdor mîna Iraqê pêk tên dûr binêrin, her wiha ji alîyê vekişîna hêzên Amerîkayê ji wir, vekişîna sîstema Patriotê ji Erebistana Siûdîyê, gelo tişta ku dibe guhartina stratejîya Amerîkayê li Rojhilata Navîn ê û li ser çi esasî ev stratejî tê kirin?**

Erebistana Siûdîyê wek tê zanîn ji destpêka salên 30yî a sedsala 20an ve hevalbenda DYAyê ye, her wiha vekişîna sîstema Patriotê ji Erebistana Siûdîyê di vê dawîyê de bi biryara serok Trump pêk hat, ew jî bi sedema derengmayîna Erebistana Siûdîyê di kêmkirina derxistina petrolê de ye. Her wiha zêdebûna derxistina petrolê li Erebistana Siûdîyê zirarên mezin li sûka petrolê ya Amerîkayê ye, bi sed hezaran ji amerîkîyên ku li zevîyên petrolê yên Amerîkayê dixebitin di gefên zirarkirina erkên xwe de ne heke bihaya petrolê kêm ma. Ji lew re divêyabû fişar li hikumeta Erebistana Siûdîyê bihata kirin ku derxistina petrolê kêm bike da ku biha bilind bibe, niha jî tê dîtin ku hêdî hêdî biha bilind dibe.

**Ji ber kuştina Suleymanî û El-Muhendis di destpêka îsal de nakokîyên Amerîka û Îranê zêde bûn, vê jî bandoreke mezin li rewşa sîyasî ya li Iraq û hebûna Amerîkayê ya li wir kir, gelo dê rêveberîya Trump agirbestê bi Îranê re bi nêzbûna dema hilbijartinên Amerîkayê re çêke yan jî dê rewş aloztir bibe?**

Hebûna hêzên Amerîkayê di dema niha de pir girîng e, ji ber hejmareke mezin ji hêzên Heşid El-Şebî yên alîgirê Îranê ku bûye parçeyek ji rejîma leşkerî ya Iraqê, lê di rastîyê de ew parçeya ji milîsan piştevanîya malî, perwerdekirin û çekan ji Îranê werdigere û bi fermana fermandarîya leşkerî ya Îranê ne Iraqê tev digere. Ji lew re ev rêxistin gefan li ewlehîya Iraqê û ewlehîya hêzên me yên li Iraqê dixwin. Di meha pêş a Hezîranê de dê danûstandinên DYAyê û Iraqê yên girêdayî lihevkirina stratejî ya 2008an de pêk werin. Ev lihevkirin der barê têkilîyên sîyasî, dîplomasî, bazirganî, darayî, enerjî, alîyên dozgerî, pêkanîna qanûn û xizmetguzarîyan de ne... her wiha lihevkirina ewlehîyê di navbera me û Iraqê de jî heye. Lihevkirina ewlehîyê girêdayî hebûna leşkerî ya Amerîkayê li Iraqê ye. Ev tevahî mijar dê di meha bê de dema her du şandeyên Amerîka û Iraqê çarenûsa lihevkirinên di navbera her du welatan de nîqaş bikin dê bibin mijarên lêkolînê. Di heman demê de hikûmeta nû ya Iraqê heye ku bawerîya parlamento û DYAyê ku li kêlek serokê hikûmetê sekinîye, wergirt, her wiha hêvî dike ku sozdayînên xwe yên kêmkirina çekan di destê hêzên leşkerî û dûrxistina van milîsan ji rejîma leşkerî ya Iraqê de pêk bîne.

Di destpêkê de kuştina Suleymanî di encama agahîyên istîxbaratê de ku hatin destnîşakirin ku dê kiryarên dijberê DYAyê pêk bianîyana, weke tê zanîn Suleymanî berpirsê teqînên ku li nêzî alavên leşkerî yên Amerîkayê di dema hebûna wê li Iraqê de ji 2003yan ve ye, ew teqîn bûn sedema kuştina zêdetirî 600 leşkerên Amerîkayê. Her wiha jî Suleymanî her tim nakokî li dewletên ereb ên mîna Lubnan, Sûrîye, Yemen û Iraqê çêdikir. Ji lew re serok Trump dît ku pêwîst e Suleyman berî karekî leşkerî li dijî hêzên Amerîkayê dike were tunekirin. Rast e Suleymanî bi alîkarîya balafirên Amerîkayê û DYAyê û teknîka istîxbaratê karî DAIŞ li Iraqê têk bibira, lê belê gelo ev tê wateya ku DYAyê agirbesteke bi Îranê re der barê hilbijartinên pêş de pêk bîne, ez texmîn



nakim. Ji ber cezayên aborî yên tund li dijî Îranê zirarên mezin di aborîya Îranê de çêkirin, mînak fînansekirina bîyanî li Îranê hat bidawîkirin, derçûnên petrolê hatin derbekirin, cezayên Amerîkayê nahêlin dewlet û şirketên bîyanî dan û standinê bi Îranê re bikin, cezayan qeydên li dijî beşa aborîya Îranê tund kirin û rejîma Îranê ji çavkanîya sereke ya qûta xwe ku petrol e mehrûm kir. Her wiha sendoqa petrolê texmîn dike ku aborîya Îranê sifir e.

Bi koronavîrus û kêmbûna bihaya petrolê re aborîya Îranê di rewşeke cemidandinê de ye. Ji lewre tu pêdivîya danûstandinê bi Îranê re tune ye, heke Îranê kiryarên xwe yên dijminatî li herêmê sekinandin û çêkirina nukleerê rawestand wê demê danûstandin bi Îranê re pêkan e û dîtina lihevkirinekê ji bilî ya ku serokê Trump di gulana 2018an de bi dawî kiriye, lê belê hin ihtîmalên zêdekirina cezayên aborî li dijî Îranê hene. Ji lewre divê çêkirina nukeelerî û moşekan rawestîne, her wiha divê kiryarên xwe yên dijminatî li Rojhilata Navîn jî rawestîne.

**Di dawîyê de pirsgirêkeke nû li Deryaya Spî derket, ew jî vekolandina dewleta tirk li herêma Qubirsê ya aborî ye, her wiha îmzekirina lihevkirina nexşekirina sînorê deryayî bi hikumeta El-Sîrac li Lîbyayê ye ku hêzên ereb ên aktîf mîna Misir û Îmaratê dijberî wê ne, gelo Amerîka çawa li van bûyeran dinêre?**

Der barê vekolandina li ser petrolê di Deryaya Spî de, weke hûn dizanin nakokî di navbera Yûnanistan û Tirkîyeyê de li ser mafên vekolandinê ji bo petrol û gazê hene, bi wê re jî xwedîyên berjewendîyên herêmî yên mîna Misir, Îsraîl û Yûnanistanê ber bi vê nakokîyê ve dikişîne.

Herêma Deryaya Spî di dema niha de herêmeke germ e bi keşifkirinên mezin ên Qubirs, Îsraîl û Misirê re. Di van salên dawîn de Tirkîye bi israr e para xwe ji vê enerjîya Deryaya Spî, li rex wê jî YEyê mijara ferzkirina cezayan li dijî Tirkîyeyê lêkolîn dike, heke bike yan na.

Li DYAyê em dixwazin nakokîya li wê herêmê kêm bibe, ewlehî û aştî li wir çêbibe, DYAyê ne dahatoyek ji bo petrolê ye. Berî koronavîrusê DYAyê petrol derdixist derve, berhema zêdetirî ya Erebistana Siûdîyê ye, her wiha zêdetirî ya Rûsyayê ye jî.

Li gorî YEyê ew naxwaze vekolandina petrol û gazê çêbibe, ji ber ew dibîne ji bo hawîrdorê ne baş e, lê belê petrolê ji dewletên dîtir dikire, ev jî nakok e, lê di rastîyê de ev li Ewropayê pêk tê.

**Jêder: Ajansa Hawarê**

# “Roja Zimanê Kurdî” li ser gorna Cegerxwîn hat pîrozkirin

**Taybet – Aştî**

Di 15ê gulana 202an de ku wekî Roja Zimanê Kurdî naskirî ye, komeka nivîskar û kesayetên Herêma Cizîrê li ser gorna Cegerxwîn “Roja Zimanê Kurdî” pîroz kir.

Bi destpêşxerîya nivîskar Konê Reş, helbestvan Ehmedê Huseynî û zimanzan Deham Evdilfetah, li ser gorna Cegerxwîn ku li Taxa Xerbî ya bajarê Qamişloyê ye, çalakîyek ji bo pîrozkirina Roja Zimanê Kurdî hat lidarxistin.

Di vê çalakîyê de, yekîtî û kombûnên nivîskaran li gel çend niwênerên partîyên sîyasî yên kurdî hazir bûbûn.

Di destpêka çalakîyê de, nivîskar Konê Reş da zanîn ku gorna Cegerxwîn wekî qadeke sembolîk ji bo pîrozkirina Roja Zimanê Kurdî hatiye hilbijartin, “çimkî Cegerxwîn helbestvanekî kurd e û nivîskarekî Kovara Hawarê bû.”

Konê Reş her wiha girîngîya xwedîderketina li zimanê kurdî anî zimên û rola binemala bedirxanîyan di dîroka Kurdistanê de bi kurtasî da nasandin.

Paşê helbestvan Ehmedê Husyenî û zimanzan Deham Evdilfetah axaftinên pîrozbahîyê xwendin.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) sala 2006an li bakurê Kurdistanê,15ê gulanê wekî “Roja Zimanê Kurdî” destnîşan kir û Tevgera Ziman û Perwerdeyê (TZP) jî ev biryara han qebûl kir û ragihand.

Çimkî cara pêşîn alfabeya kurdî\latînî di



15ê gulana 1932yan da bi rêya Kovara Hawarê hatiye weşandin, loma KNK û TZPyê ev roj hilbijart.

Lê hêja ye mirov balê bikişîne ser wê yekê ku berî biryara KNKyê û heta niha jî, nivîskarên rojavayê Kurdistanê yên wekî: Konê Reş, Derwêşê Xalib, Xelîl Sasonî, Seydayê Keleş û hwd di 15ê gulana her sal de ev roja han bi hin çalakîyan bi bîr dianî û wan jî ev roj wekî “Roja Zimanê Kurdî” qebûl kiribû.

# Xewna kalo

**Abbas Ismaîl**

Perçên ewrên reş û spî li hev swar dibûn, pêşbazî bi hev re dikirin, çavê ronahîyê xwe di nav de veşartibû. Wan ewran tîrêjên rokê jî nuxumandibûn. Lê hinekan ji wan xwe didizîn, awirine tûj û bikîn berdidan cîhanê. Bayekî germ jî dikire fîzefîz,qirş û qalên wê deverê weke kerîyê berxan didane ber xwe; geh ew lihev dibanandin geh ew tarmarî dikirin. Dema wî bayî bîna xwe berdida, hilma wî weke bîna miraran jê dihate der. Seqayeke wilo balkêş tu salan bi ser vê deverê de nehatibû. Kalo ji xwe re digo: Helbet ev e roja rabûnê… wê îro Decal ji alîyê bareş bê. Riha wan ji wan dirêjtir e, bi xakê ve dixijiqe toz û domanê radike, însan mest û gêj dike. Dûv re Decalê mezin bang dike:

“Her tiştên xwe bixwin, va ye wê dunya wêran bibe, ma hûn dê çibikin ji malê dinê, ji keç û kuran, ji qesir û qonaxan!”

Kalo di xew de hinekî firfitî ,çavê xwe vekir û girt. Gewdê wî tev xutcilî, belê zû kulmişî kete xeweke nîvco. Xeman û sawêran carek din êrîş berda hiş û ramanên wî. Dît çawa belafireke bêdeng li ser riwê xakê li wê çolebirê bi rê ve diçû. Ajokerê wê desmalek spî li dor serê wî gerandî bû, aleke rengê wê kesk bi pozê belafirê ve hildayî bû. Sîbera wê alê berfireh bû, xuyabû ku nîvê dunyayê xistibû bin sîya xwe. Yê ajoker qîr kiribû sitranê û pê re du gazan devê xwe vedikir û digot: “Anuha ez ê bêm te bigirim!”

Kalo berê xwe ji wê dîmenê guhert; bê ling û dest baz da, bi çîyê ve hilkişîya, kete nav lat û zinaran, xwest xwe di şikef-



teke tarî de veşêre. Belê ji bextreşîya wî, mirovek ji zinarekî derket, weke dêwê sêquloç bû. Li himber wî rawestîya. Qirika wî dirêj bû digiha ber perê esmanan; devê wî serhev çûyî bû, weke herxeke kûr xuya dibû; çavêd wî zerdoq bûn, fireh bûn, weke du golên avşîn bûn; destên xwe yên wek du darçîqan bilind kiribûn; her du tilîyên çavderxistine, dirêj kirin raser çavêd Kalo. Jê re got, ji niha û bîstekê ez ê bêm te bavêjim çemê Zinarê, bila masî bi goştê te şa bibin. Rê li ber Kalo hate girtin. Rabû destê xwe bal bi esmanan vekir, berzûrî Xweda û ewlîyan bû, girîya, çavêd wî di gola histiran de newq bûn. Kurtedemekê ber xwe nedît. Belê çaxa çavên xwe paqij kirin û dunya jê ve xuya kir, xwe li deşteke kesk û sor, dûz û fireh, vala, bê ins û cin, dît. Çavê xwe gerand ji bo kesekî, şivanekî, gavanekî bibîne. Li dor xwe nêrî , li esmanan nêrî, dunyayeke ker û lal, ne mêşek ne morîyek, ne tilûrek, ne tehtebejek. Bê xwedî ji xwe re got: “Hebe tune be dunya xera bûye, ez tenê mame!”

Hinekî bi rê ket, gavêd xwe firehtir kirin, hest dikir ku rûyê zemînê nerm e; ne weke ya zemanê berê ye. Ji xwe re digo; “ez ê çawa bijîm? Belê ya baş ez bilezînim dibe ez buhiştê yan dojehê bibînim.” Gavêd xwe radan dirêj kirin û ji nişkan ve xwe dît ku raser şêxekî rawestîyaye. Şaşikeke mezin û rengîn li serê wî şêxî bû, cibeyek nexişandî di ser kapokê re lê bû, çav kildayî bû, lapûşkên wî weke yên şêran bûn. Ew şêx ketibû ser kelaxê berazekî mirî. Çaxa wî şêxê weke mîrê cina Kalo dît, lapûşkên xwe yên bixwîn bal de birin û jê re got; “anuha ez ê te jî bikim qurbana ûcaxan!” Dema Kalo ew pencên bixwîn dîtin, ji xew veciniqî, çeng bû, nirîn û nalîn jê hat, kire hewar û bang kir:

“Lawo Elî, Hesen, Hisên, Mihemed… werin bi min ve, hindik maye ez dîn bibim, ez hiş berdim, ez ji maran yên bi quloç, keftarên zinaran, hirçên mirovxur neditirsîyam; min berê xwe ji gule û berikên top û şeşxanên Horos nedigu-hert! Kurê min Mihemed lawo reng e wê Decal rabe, wê Îsrafîl pif ke bedena Çînê, wê biherifîne, wê Yacûc û Macûc ji pişt derkevin ter û hişk bidin ber xwe. Bi gelacî û xinizîya Decal, Yacûc û Macûc kesekî li ser rûyê vê zemînê nabêlin. Kurê min, tu û birayên xwe û cînarên xwe hevdû bibexşînin bê guman e dawîya dinê ye. Ma çawa însan dixwaze însanan bixwe?! Ma çawa şêxê mezin goştê berêz bixwe! Lawo xewnên min dîtin kes nebîne!”

Kalo her bînekê dikir hubehub, dilerizî, digirîya ta ku ji dest xwe diçû. Hêrz û huneran xwe ji laşê wî berdan, çavêd wî zerdoq bûn, xirînek ji kûraya kezeba wî derket, kesereke kûr berda bi zor û kotekî dengekî melûl jê derket. Bang kir Mihemed:

“Kuro lawo wî ajokerê belafirê çima dixwest min bixwe? Ho weh, ma ew şêxê bi tirme û şaşik çima dixwest min bixwe kuro!”

Careke din xirînek ji Kalo hat çavêd wî zexel bûn, dûv re hatin girtin. kul û kedera wateya wan xewnên bi gincir û metirs, pê re çûn gorê.

Ji pirtûka “Çîrokên gelê min”